



(kurdisch-kurmandschi)

Nexweşên xweşewîst,

Em Textorên dirana bi dilxweşî amadene li nexweşiyên we bikolin (fehis bikin) û çareser bikin. Win gelekî bixêrbên nexweşxaneyên me.

Jibo çareseriya nexweşiyê pêwiste têgehiştina ziman û axaftin bi Textorê diran re baş bê. Her Textorêkî dirana wê pirsan ji we bikê: weke nemûne – cihê êşê li kuderê ye, êşa te ji kenkî ve destpêkiriye, yanî ti hest bi fişarê (zextê) li ser diran dikê yan na? Bersivên we gelekî giringin, da ku Textor bizanibin çî nexweşiyên we hene û çareserî û derman destnîşan bikê.

Li ser şêwazên (rê yên) çareseriyê û metirsiyên, ku dibê di berhema wê de derkevin, pêwiste her Textorêkî ji we re şirove (eşkere) bikê. Jiber wê gelekî giringe, ku win bikaribin jê re bêjin: weke nemûne – narehetiya (hesasiyet) we beramber çî dermanan, yanî hin nexweşiyên taybet weku HIV (AIDS), yanî zerika reş (Hippatit C), yanî ducanî (hemil) heye yan na? Her Textorêkî, ku we çareser bike û wan agehdariyan (informasion) ji we ne pirse û şirove neke, xwe dixê jêr tawanbariyê (siza, ceza) û jiblî wê tendrustiya we jî dikeve jêr metirsiyê (tehlûkê) de.

Heger win bixwe zimanê elemanî nizanibin, kesekî (mirovêkî), ku ziman dizane û bikaribe bi Textor re biaxive bi xwe re bênin. Ne merce (ne şerte), ku ew mirov wergêrekî (Tercûman) fermî (resmî) be, lê belê pêwiste ku bizanibe bi elemanî biaxive û têbighêje.

Jibo çareseriya nexweşiyê (îlacê), ji kerema xwe kaxeza pirs û bersivan a jibo Nexweşan pîrr bikin û bi xwe re bênin.

Herweha, ji kerema xwe nasnama xwe ya kesayetî (nifûs) û kaxeza (nama) razîbûna çareseriya nexweşiyê bi xwe re bênin. Jibo bidestxistina kaxeza (nama) razîbûna çareseriya nexweşiyê, ji kerema xwe bi cihê alîkariya civakî re (Sozialamt), yanî bi rêvebirên cihê, ku win di dema hazir de lê dijîn bi axivin (bixwazin).

Emê bi baştrîn şêwaz xizmeta we bikin!

Textorên we yên dirana li Niedersachsen